

zarokno, bi zimanê xwe bixwînin û binivîsin!

KULÎLK

kurdiska elevernas barntidning

KOVARA ZAROKÊN KURD YÊN ŞAGIRT



Hejmar: 44

**HÊJE MÊJE
EMÊ NUHA ÇEND
ÇÎROK Û MESELÊN XWE
JI WE RE BÊJIN**

Kuîlk

Sal: 1990

(3)
MIRÎYÊ DEH PERA

Berhevkar: Bavê Hêvî

Hemo çend xeber jê re da, lê yê bajarî li ber dilê wî geriya û li hev hatin. Paşê sindoqa xwe vekirin û zêr û mecîdiyên xwe li hev parê kirin. Piştî xatir xwestinê her yekî berê xwe da mala xwe.

Hemo çû gundê xwe û bi xêra wan peran bû zengînê gund. Lê, destê xwe li peran negirt û vir de wê de avêt. Bi vî awayî dawiya peran anî. Dema ku zivistanê devê derî girt, qurişek pere li mala wî nemabû. Ew û pîreka xwe bi ser hevdu de ponijîn. Bîstikekê wiha man û dûre pîreka wî bêdengî xera kir û ji wî pirsî:

- Mal şewitiyo, ma ewqas perê te hebûn. Te hemû çawa kir ? Ma qey tu deynê te li kesî tune ye, ya jî tu birak û dostên te yên ku bikaribin li ber barê me rabin nîne ?

Ji nişka ve deh perê wî yê li bajarî hat bîra wî û bi kêf ji pîreka xwe re got:



- Ha ha ! Hat bîra min. Deh perê min li yê bajarî mabû. Ez ê îro herim perê xwe bînim.

Ji malê derket û berê xwe da bajêr. Li bajêr, li mala birakê xwe pirsî û lê nerî ku birakê wî gelekî zengîn bû ye. Dikanek ne serî û ne binî rê wî dan û jê re gotin:

- Ev dikana birakê te ye.

Lê, birakê wî bi xwe ne li ber dikanê bû. Yekî ku li dikanê de dixebitî da pêşiya wî û ew bir ber deriyekî mezin. Bi şiklê lêxistina derî, Suphî ket şikê û ji pîreka xwe re got:

- Hela binere, bê ew hevalê min yê kurmanc e an na. Deh perê wî li min bû. Ez bawerim, ew hatiye perê xwe. Jê bipirse ku ew be, bêje birakê te mirî ye.

Jinik hat devê derî û jê pirsî ku ew birakê mêrê wê ye an na. Gava mêrik xwe da nasîn, jinikê bi kelogirî jê re got:

- Ma ne birakê te mirî ye.

Mêrik dizanîbû, ku ev dek û dolab in. Wî birakê xwe baş nasdikir. Loma jî, ji jinikê re got:

-Xwakê, tu ji kerema xwe re derî li min veke, ku hema qet nebe ez kincên wî an jî nivînê wî bibînim. Bi kêmanî, niha bêhna wî

jê tê. Jinik bi lez vegeriya û ji mêrê xwe re got, ku birakê wî weha dibê.

Yê bajarî li pîreka xwe vegerand:

- Keçê, derî veke bila bê hundir. Ez ê wek miriya di nav nivîna kevîm.

Suphî xwe wek termekî di nav nivîna de ramedand. Hemo hat ber serê wî rûnişt û jê re got:

- Kuro, ka rabe ser xwe û deh perê min bigire min. Ma ne şerm e, ji bo deh pera te xwe xistiye nav ciya ? Ma qey ez te nas nakim.

Hemo destê wî bilind kir ranebû. Lingên wî bilin kir ranebû. Derzî jî di wî de rakir, lê dîsa feyde nekir. Bîhna wî teng bû, derket ser balkonê, ku cigarakê bikşîne. Lê nerî, ku Abdulxefûr Efendiyê mirîyan dişo di kuçê de derbas dibe. Bi dengê bilind gazî wî kir:

- Abdulxefûr Efendî! Abdulxefûr Efendî! Miriyakî me heye, ma tu nayê naşo ?

Abdulxefûr Efendî lê vegeriya û got:

- Çima ez naşom. Ma karê min çiye ?

Herdû hatin hundur. Mêrikê bajarî li ser textekî danîn û dest bi şuştinê kirin. Tasek ji ava kelandî lê dikirin û yek sar ji bi serde dadikirin...Deng ji dîwêr derdiket, lê

ji mêrik dervediket. Hemo her di nav re bi bergerandî digot:

- Lawo, weleh tu sax e. Me te bi saxî kuşt. Rabe deh perê min bide, bû êvar ez ê herim malê. Lê, dîsa tu bersîv negirt û mêrik her xwe li mirîtî danî. Hêviya Hemo her ku diçû qels dibû. Ew şuştin û xistin nav kefen. Dûre, Hemo ji pîreka wî re got:

- Birakê min wesiyeta xwe li min kiribû. Gorî wesiyeta wî, divê em wî di Naoza bi-nya bajêr de veşerin.

Abdulxefûr Efendî jî got:

Weleh, ev fikrek ne xerab e. Ji xwe zivistan e û kolandina erdê jî zahmet e.

Hemo, birakê xwe avêt ser milê xwe û berê xwe da Naozê. Hat ber devê Naozê û bi kerb û kîn ew avêt binê wê. Dîsa jê re got:

- Lawo, rabe ser xwe! Weleh ez dizanim ku tu ne mirî ye. Deh perekê min bide û ez ê herim malê. Lê, dîsa jî tu deng ji Suphî nehat.

Dengek ji ser tahtê Naozê hat û Hemo dît ku komek însan kete hundir. Ji tirsê, xwe xis bin "meytê" bajarî û li wan kesên ku hatibûn hundurê Naozê Temaşe kir. Tu nabêje, wan xezîna dewletê vekiribûn û teva zêr û perên ku dizîbûn hatibûn wir. Yekî di nav wan de şûrekî nuh ji xwe re kirî



☆ ☆

☆



☆

**bû. Ji kêfa pera, nema zanîbû wê çî bikira.
Ji nişka ve şûrê xwe ji kalan kişand û got:
- Ez ê şûrê xwe biceribînim, bê çiqasî tûj e.**

**Li ser "meytê" bajarî sekinî û şûrê xwe bil-
ind kir ku lêxe. Ji tirsê barînî bi yê bajarî
ket. Xofek mezin dizan girt û bi lez ji wir
bazdan. Yê bajarî rabû ser xwe û ji birakê
xwe re got:**

**- Te dît birako. Min çî xêr û bereket çêkir.
Eger min weha nekiriba, ev peranan ji me
re nediman.**

**wan ew pere bi dilşadî li hevdu par kirin.
Li aliyê din jî, dizên xezînen li hev civiyan
û ji hev pirsîn:**

**- Ma ew çî bû hat serê me? Kê ji nav me
weha kir?**

Yekî ji wan got:

**- Remo Hûro bû. Wî xwest şûrê xwe li mi-
riyan biceribîne. Ma ceribandina şûrê wî
ne li ser miriyan ba, ne dibû?**

**Gişa bi hev re biryar dan, ku Remo Hûro
vegere Naozê û binere bê çî qewimî ye; Bê
mirî rabûn ser xwe ya jî hineka bi qazî li
wan weha kirin! Wan Remo Hûro baş
tembîh kirin û jê re gotin:**

- Divê tu here Naozê baş sax bike û vegere.

Remo Hûro bi tirsek mezin berê xwe da Naozê. Çongên wî dilerizîn, gupe gupa dilê wî bû. Gava serê xwe dirêjî hundurê Naozê kir, Suphî xwe çeng kir kumê wî, da Hemo û got:

- Lawo, ji te re. Ev kum jî di dewsa deh perê te de.

Ziravê Remo qetiya bû. Bi bazdan li hevalê xwe vegeriya. Devê wî li hev diket û bi zorê gotin ji dev derdiket:

- Lawo bazdin! Mirî giş bi hev re rabûnin. Ew perên me li hevdu parê kirinin û her yekî deh pere para wî ketiye. Tew yek ji wan bêpar mabû. Kumê min ji serê min ket û ew jî di dewsa deh pera de dan wî..

(dawî)

Quncika Matematîkê

1) Newal erebak kirê kir û erebe heftakê li ba wê ma. Newal 1680 kron da xwedyê erebê. Gelo, roja erebê bi çiqasî bû?

Bersîv:

2) Çar heval diherin sînema. Bi hev re 115 kronên wan hebû. Lê, çar bilêt 140 kron dikir. Gelo her bilêtek bi çiyê û çiqas perê wan kêmbû ji bo bikaribin 4 bilêtan bistînin.

Bersîv:


3) Nalîn ji bo biçê Kurdîstanê pere dida ser hev. Her rojê 15 kr dixist qutiya pera. Di dawiya 6 mehan de, çiqas perê wê dikeve ser hev?

Bersîv:

4) Hejmara xwendevanên dibistanê 145 in. Ji wan 72 lawik in. İro 13 keçik nexweş in û nehatinin dibistanê. Gelo, İro çend keçik hatinin dibistanê?

Bersîv:

VAN HEJMARAN YEKO YEKO BIGHININ HEV




**BAJARÊN HER PERÇÊN
KURDISTANÊ JI NEXŞÊ
BINEQÎNIN Û BINIVÎSÎNIN!**

1) Kurdistanana Bakur:

2) Kurdistanana Rojhilat:

3) Kurdistanana Başûr:

4) Kurdistanana Rojavaya Başûr:



PÊZANÎN

1) Tişteki min heye tiştanî,
Ji diya xwe dibe, Panzdeh roja disekine,
Paşê dest û ling çê dibe.

Ew çi ye?

Bersîv:

2) Apekî minî rû kurkirî,
Şev û roj dardakirî.

Ew çi ye?

Bersîv:

3) Tişteki min heye,
Bi şev dixemile,
Bi roj ditemire.

Ew çi ye?


Bersîv:

4) Berê fûr da,
Misûr çiv da,
Gulek derket,
Nûrek dev da.

Ew çi ye?

Bersîv:


MIJÛLÎ



ANATOMIYA SERÎ

DEV Û GEWRÎ

14-37 dev û gewrî	ağız ve boğaz	bouche et pharynx	mouth and throat
14- lêva jorîn	üst dudak	lèvre supérieure	upper lip
15- pidî	diş eti	gencive	gum
16-18 DIRAN an DIDAN	DİŞ	DENT	TEETH
16- diranên pêşîn, beşîk	kesici dişler	incisives	incisors
17- diranên tûj, qîl	köpek dişleri	canines	canine tooth
18- diranên kursi, diranên paşî	azı dişler	molaires	molars
19- kujê lêvê	dudakların birleşme yeri	commissure des lèvres	labial commissure
20- esmanê dev, panfka dev, kama dev	damak	palais	hard palate
21- nermika esmanê dev	yumuşak damak	voile du palais	soft palate, velum
22- zimanê biçûk, zimanok	küçük dil	luette	uvula
23- behîvok, aloq, gelale	bademcik	amygdale	tonsil
24- gewrî, hefik	boğaz	pharynx	pharynx
25- ziman	dil	langue	tongue
26- lêva jêrîn	alt dudak	lèvre inférieure	lower lip
27- çena jorîn	üst çene	mâchoire supérieure	upper jaw
28-37 DIRAN	DİŞ	DENT	TEETH
28- kîsikê diran	dişkökü zarı	coiffe de la racine	periodontal membrane
29- hesteyê diran	diş çimentosu	cément	dental cementum
30- sedefa diran	emaye	émail	enamel
31- aca diran	fildişi kısma	ivoire	dentine
32- pûka diran	iç/orta tabaka	pulpe dentaire	dental pulp
33- reh û damarên diran	diş sinir ve damarları	nerfs et vaisseaux sanguins	nerves and blood vessels
34- beşîk	kesici diş, ön diş	incisive	incisor
35- diranê kursi	azı diş	moltaire	molar
36- koka diran	diş kökü	racine	root
37- taca diran	diş tacı	couronne	crown
kepîr	kireç	tartre	tartar
kepîr girtin	kireç tutmak	s'entartre	to fur up



QUNCIKA MUZİKÎ

Notenivîs: Zozan Ozmanî

♩ = 120

3 Lê bi hole

Lê bi ho - lê, ho - lê, ho - lê, bi ho - lê, ho - lê, ho - lê, bi ho - lê.

Lê bi ho - lê, ho - lê, ho - lê, bi ho - lê, ho - lê, ho - lê, bi ho - lê.

3) LÊ BI HOLÊ

Lê bi holê, holê, holê, holê bi holê
Lê bi holê, holê, holê, mala mi tolê

Ne hol im, ne holvan im, lê, lê holê
Ne gul im, ne rihan im, mala mi tolê

Ne gul im, ne rihan im, lê, lê holê
Ne deşt im, ne zozan im, mala mi tolê

Heçkf mala hol tê da, lê, lê holê
Heçkf mala hol tê da, mala mi tolê

Şûr girêda mertal pê da, lê, lê holê
Şûr girêda mertal pê da, mala mi tolê

Mezin e, hey mezin e, lê, lê holê
Mezin e, hey mezin e, mala mi tolê

Konê Hokê mezin e, lê, lê holê
Şewitya, şewitf mezin e, mala mi tolê

Stûna navê hesin e, lê, lê holê
Stûna navê mezin e, mala mi tolê

Par qîz bû, îsal jin e, lê, lê holê
Par qîz bû, îsal jin e, mala mi tolê

Biçûk e, hey biçûk e, lê, lê holê
Biçûk e, hey biçûk e, mala mi tolê


Konê Hokê biçûk e, lê, lê holê
Şewityê, şewitf biçûk e, mala mi tolê

Stûna navê çirûk e, lê, lê holê
stûna navê çirûk e, mala mi tolê

Par qîz bû, îsal bûk e, lê, lê holê
Par qîz bû, îsal bûk e, mala mi tolê

Lê bi holê, holê, holê, lê, lê holê
Lê bi holê, holê, holê, mala mi tolê.

KOM BIKE \hat{U} BOYAX BIKE

1+4	2+5	3+6	6+1	1+8
3+2	7+2	4+3	7+2	2+5
				
2+2	3+5	7+3	6+4	3+3
4+2	4+6	4+4	5+5	4+6

5 = SOR

4 = KESK

7 = SOR

6 = KESK


9 = SOR

8 = KESK


11 = ZER

10 = KESK

EZ KÎ ME ?





Di avê de dijîm
Ne ling ne jî destên
min hene.
Ez kî me ?



RENG

kurdî	tirkî	fransizî	îngilizî
spî	beyaz	blanc	white
reş	kara	noir	black
sor	kırmızı	rouge	red
zer	sarı	jaune	yellow
kesk, sewz	yeşil	vert	green
şîn	mavi	bleu	blue
qehweyî	kahverengi	marron	brown
qemer	yağız	basané	swarthy
qemerê vekirî, esmer	esmer	brun	dusky
gewr, spiyê girti	açık gri, açık	clair, gris clair	light, light grey
qerqaş, çîl spî	bembeyaz	blanc éclatant	bright white
binevşî, mor	mor	violet	purple
pembe	pembe	rose	pink
erxewan	şarabrenge	pourpre	crimson
kej	kumral, sarışın	blond	blond, fair
bor	kızıl	roux	red-haired, redhead
boz	boz	gris-pommelé	dapple-grey
çûr	açık sarı	jaune clair	light yellow
qîçîk	saman sarısı	jaune paille	straw colour
qer	parlak siyah	noir brillant	bright black
şê (qehweyê bi sorayîve)		alezan	chestnut
genimî	açık esmer	couleur de blé	wheat colour
şîrî	sütbeyaz	opalin, laiteux	opaline
xakî	haki	kaki	khaki



EM BIRA NE

Em bira ne, xortê kurd in
Tev dixwînin yek ziman
Ev tev mêr in tev jî merd in
Daxwaza me Kurdistan

Bijî bijî dibistan
Bijî bijî dibistan

Dibistana me bilind e
Tê de hene sê derî
Cihê wê roavayê gund e
Bi kulek û pencere

Bijî bijî dibistan
Bijî bijî dibistan

Her navbêra du dersan
Kêlîkê lîske bazî
Me hêviye ji yezdan
Her sal bi serfirazî



Bijî bijî dibistan
Bijî bijî dibistan


Bi rûspîtî em herin
Cem bira û bavên xwe
Bi şermîsarî nerin
Dilşikestî malên xwe

Bijî bijî dibistan
Bijî bijî dibistan

TÎRÊJ

XAÇPIRS





NAVÊ WÊ HEYWANÊ ÇI YE ?

NAVÊ YÊ NÊR ÇI YE ?

NAVÊ "ZAROKÊ" WAN ÇI YE ?

EM ÇI JI WAN DIGRIN ?

EW ÇI DIXWIN ?

BERSÎVA PÊZANÎNA

1) Hel- helo,
Bel- belo,
Simêl belo,
Sim- simî,
Dîwar simî.
Ew çi ye?

Bersîv: MIŞK

2) Zîlî zeman,
Nexşî tûman,
Ne dîn ne îman.
Ew çi ye?

Bersîv: MAR



3) Tişteki min heye tiştanok,
Ber kevirê xiştanok,
Ne gur dixwe, ne jî hirç.
Ew çi ye?

Bersîv: KÛSÎ


4) Tişteki min heye,
Canê wî goşt e,
Kincê wî derzî.
Ew çi ye?

Bersîv: JÛJÎ

XACEPIRS (43)




			1				
			P				
2	H	E	S	P			
			L				
		3	Ç	Ê	L	E	K
4	B	I	Z	İ	N		6
			M		M		
5-	G	A	K	O	V	Â	
			K			H	




**KEREKÎ ME HEBÛ
Û KUNDIREKÎ ME
KERÊ ME
KUNDIRÊ ME KOT KOT

ME JÎ ÇÎROK
Û MESELÊN XWE
YÊN VÊ HEJMARÊ
JI WE RE GOT**

Kulîlk





YAN

KURDISTAN

YAN NEMAN !

UTGIVARE

KURDISTANS ARBETAR-KULTUR FÖRENING

WEŞANA KOÇ - KAK

KOMELA ÇANDA KARKERÊN KURDISTANÊ

ADRESS - NAVNÎŞAN

POSTGIRONR. 98 66 50-0

BOX 7031

163 07 SPÅNGA - STOCKHOLM

SWEDEN

PRIS : 15,- skr

BIHA